

Denazana Şamê nemana xwe da piş xwe û berê xwe da manê

Mem Alan

Piştî girtina /12/ kesan ji serkirdayatiya Danezana Şamê ji aliyê hêzên ewlekariyê ve , zora hatiye ser wê , û hewildana rijêmê ku , danezanê tune bike; Tirsek li ba hemî piştgir û dostên wê peyda bû ku , belkî tune bibe û were herifandin yan jî bi kêmanî ji armancên wê bê yaldan . Û hin endamên wê ji tirsê xwe re ji rîya girtine derkevin.

Lê tiştê bûye bervajî wê nêrînê bû. Danezanê bi siyaseta û helwestek li dûzan , pîvayî , ne hezhezokî , û bê zêdekavî an kêmgavî xebata xwe berdewam kir û rêça xwe ya mandîne qelaşt. Ji alîkî ve, di hemî bûyeran de , xwedî nêrînê û helwestê bû, herweha li hemî bajarên hundir sûriyê û welaten ewropî ku , - lê heyî-, wê dest bi avakirina şaxên xwe kir, û li vê dawiyê rûniştina li Almaniya bo avakirina şaxekê li wir jî mênakek bû. li gel wê pêrabûna bi gelek çalakiyan li derve , di çarçewa hevdiñtinan de, bi

hin aliyên sêvîl yên. Ewropî re , û beşdarbûna li gonfiransên ji bo mafên mirovan li Sûriyê hatine girêdan mênakek dê bû. Herwiha tiştê tewrî balkêş, ronak û mirov pê serbilind dibe , berxedana girtiyên Danezanê yên ku , bihna siyasetek pîvayî û bê tu vegeer ji armancên Danezanê di zîndanê û li pêş dadgehê de. Ta radeya ku , ji aliyê dadgehê ve , bi hirhitandina avakirina dewleteke netewî Kurd li Sûriyê hatin gunehkar kirin .

Ew berxwedana dihêle û wê her bihêle ku, temenê wê dirêj bibe. Wê lomê jî, me got Danezana Şamê berê xwe daye manê .

Vêca gereke herkesekî welatperwer û xêrxwazê vî welatî û gelên wê , û bi taybetî gelê me yê Kurd li dor Danezanê bicive û lê xwedî derkeve. Ji ber ku ev tar û çembera yekemîne li Sûriyê , piraniya gelên Sûriyê dide ser hev û di hindir xwe da dicvîne, û li pîrsa Kurd li Sûriyê dibe xwedî

Dumahhîk

:

Fermana

"49"an

daye zorker û çavsorên ku her dem û gav gelê me riswa dîkin, werîsê mirinê li stuyê wî badidin û berê xwe dane hev, şer û berberiya kevna ya sedên salan dîkin..!! Ma gelo di siha vê êrîşa hovane de, dema vê devavêtin, pevçûn û berberiya xwexwetî ye..?!.

Em armancên van ton pilanan baş dizanin û nas dîkin, ew dixwazin em ji welatê xwe derkevin û xaka xwe bi wan bihêlin da ew xêr û bêra wê

bixun. Lê, ew ê vê xewnê nebînin û di vê pilana xwe de jî têk herin. Ji ber ku gelê me asê bi xaka xwe ve girêdayî ye, tucarî ew ji welatê xwe, welatê bav û kalên xwe nagere û wî di destê xelkên de nahêle. Rast e ku, ew bi van pilanên ne mirovane têşe, baca wan bi giranî û buhayî dide jî, lê, ew welatê xwe bernade. Ji ber ku welatê wî di hiş, dil û canê wî de cihê herî mezin, berz û bi rûmet girtiye.

Şam 11.11.2008 Z-2620 K